<sup>46</sup> Margreet Dorleijn, *The Decay of Ergativity in Kurmanci*, Tilburg University Press, 1996, r. 36

<sup>47</sup> Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastmûştîşe Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2005, r. 44

<sup>48</sup> Mehmet Uzun, “Fekanî Zazakî (Kirdkî) û Problemanî Standardîzekerdişî ser o”, *Vate, Kovara Kulturî*, nr. 1 Payiz, 2008, r. 38-39.

## 2. ZEMÎRÎ (CÎNAV)

### 2. 1. Zemîrê Kesî (Cînavên Kesî)

Zemîrî cayê nameyan gênê. Ziwani kenê asan. Merdim wexto ke qisey keno, çiqas çekuyanê asan û kilm bixebitno hondê baş o. Eke ma qiseykerdana xo de yew ra bahs kerd, nameyê ey rey xebitna, hewce nîyo ke merdim reyna nameyê ey wedarno, hurînda ey de êndî merdim şikîno zemîri ey bixebitnonê. Hama hama her ziwani de di birrî zemîri kesan estê. Yew seba zemîrê kerdoxî yew zî seba objeyî. Zaf ziwani da nê zemîrê kesan seba kirdox û objeyî sabit e, nêvurîne labelê kirmanckî û kurmanckî de merdim nêşikîno vajo ke no zemîr hertim zemîre kerdox o yan zî ey objey o. No goreyê qaydeyanê ziwani vurîno. Cêr ra seba nê zemîranê tayê ziwani bînan de nimûneyan bidîme, aye ra dime ma nînan mîyanê cumleyan de bixebitnîme:

**Tablo 101.** Tayê ziwani bînan de zemîrê kerdox û objeyî

	Tirkî	Franskî	Latinkî	Almankî	Îngîlîzkî	Yunankîya kane
<b>Zemîrê Kerdoxî</b>	Ben	Je	Ego	Ich	I	εγω
	Sen	Tu	Tu	Du	You	συ
	O	Il /elle	Is/ea/id	Er/sie/es	He/she/it	αὐτός
	Biz	Nous	Nos	Wir	We	ἡμεῖς
	Siz	Vous	Vos	Ihr	You	ὕμεῖς
	Onlar	Ils/elles	Ei/ae/ea	Sie	They	αὐτοί
	<b>Zemîrê Objeyî</b>	Beni	Me	Me	Mich	Me
Seni		Te	Te	Dich	You	σε
Onu		Le/la	Eum/Eam/id	Ihn/sie/es	Him/her/it	αὐτόν
Bizi		Nous	Nos	Uns	Us	ἡμάς
Sizi		Vous	Vos	Euch	You	ὕμάς
Onlari		Les/les	Eos/eas/ea	Sie	Them	αὐτούς

*Seba xebitnayîşê miyanê cumleyan de nimûneyî:*

**Demo Nikayin/hîra: (Dema Niha/Fireh)**

**Tirkî:** **Onlar** beni görüyor

**Îngilizkî:** **They** see me

**Kirmanckî:** **Ê** mi vînenê

**Kurmanckî:** Ew min dibînin/divînin

**Demo vîyarteyo dîyar:**

**Tirkî:** **Onlar** beni gördü

**Îngilizkî:** **They** saw me

**Kirmanckî:** **Înan** ez dîya

**Kurmanckî:** **Wan** ez dîtim

Seke cor de zî aseno, nimûneyanê tirkî û îngilizkî de zemîranê ke cayê kerdoxî girewto tewr nêvurîyê, labelê kirmanckî û kurmanckî de nê di birrî zemîrî tayê cayan de bîyê kerdox, tayê cayan de zî bîye obje.

**Tablo 102.** Zemîrê kesî yê sadeyî û anteyî (oblîkî)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ		FEKÊ GINGIMÎ		KURMANCKÎ	
Halo Sade	Halo Oblîk	Halo Sade	Halo Oblîk	Halo Sade	Halo Oblîk
Ez	Mi	Ez	Mi	Ez	Min
Ti	Tu	To <sup>49</sup>	To	Tu	Te
Wi (n)	Yi	O	Ey	Ew	Wî
Ya (m)	Yay	A	Aye	Ew	Wê
Ma	Ma	Ma	Ma	Em	Me
Şima	Şima	Şima	Şima	Hûn	We
Yi	Yin	Ê	Înan	Ew	Wan

<sup>49</sup> Fekê Gimgimî de tayê cayan de halê sadeyî de herînda “to” de vanê “ti”.

**Tablo 103.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî: Wendiş/Wendene*

(Xwendin)

<b>FEKÊ ÇEWLÎGÎ</b>	<b>FEKÊ GIMGIMÎ</b>	<b>KURMANCKÎ</b>
Ez ha wûnenû.	Ez hawo wanena/o.	Ez dixwînim.
Ti hê wûnênî.	To hawa wanena.	Tu dixwînî.
Ti hê wûnêna. <sup>50</sup>	To hawa wanena.	Tu dixwînî.
Wi ho wûnenû.	O hawo waneno.	Ew dixwîne.
Ya ha wûnena.	A hawa wanena.	Ew dixwîne.
Ma hê wûnênî.	Ma hayê wanênîme.	Em dixwînin.
Şima hê wûnênî.	Şima hayê wanênê.	Hûn dixwînin.
Yi hê wûnênî.	Ê hayê wanênê.	Ew dixwînin.

**Tablo 104.** *Wendiş/Wendene (Xwendin)*

<b>FEKÊ ÇEWLÎGÎ</b>	<b>FEKÊ GIMGIMÎ</b>	<b>KURMANCKÎ</b>
Mi wend.	Mi wend/e.	Min xwend.
Tu wend.	To wend/e.	Te xwend.
Yi wend.	Ê wend/e.	Wî xwend.
Yay wend.	Aye wend/e.	Wê xwend.
Ma wend.	Ma wend/e.	Me xwend.
Şima wend.	Şima wend/e.	We xwend.
Yin wend.	Înan wend/e.	Wan xwend.

<sup>50</sup> B. cênotê 13.



## 2. 2. Zemîrê Nîşanî (Cînavên Nîşanî)

Zemîrê ke çiyêk, kesêk û cayêk yan zî çîyan, kesan û cayan musnenê ma, ma înan ra vanîme zemîrê nîşanî. Zemîrê nîşanî zî sey zemîrê kesan bi eynî qaydeyan yêne xebitnayenê. Nê zemîrî mîyanê xo de benê di birrî: semedê nêzdî û semedê dûrî

### 2. 2. 1. Zemîrê Nîşanî yê Semedê Nêzdî (Cînavên Nîşanî Yên Nêzîk)

Mêrdim çiyêk/kesêkê yan zî çîyanê/kesanê nêzdî îşaret keno herinda nameyanê înan de nê zemîranê nîşanan xebitneno.

**Tablo 105.** Zemîrê nîşanî yê semedê nêzdî yê hem sadeyî hem zî anteyî

FEKÊ ÇEWLÎGÎ		FEKÊ GIMGIMÎ		KURMANCKÎ	
Halo Sade	Halo Oblîk	Halo Sade	Halo Oblîk	Halo Sade	Halo Oblîk
Ini	Inî	No	Nê	Ev	Vî
Ina	Inay	Na	Naye	Ev	Vê
Inî	Inîn	Nê	Nînan	Ev	Van

**Tablo 106.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ini vûno.	No vano.	Ev dibeje.
Ina vûna.	Na vana.	Ev dibeje.
Inî vûnî.	Nê vanê.	Ev dibejin.

**Tablo 107.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Inî va.	Nê va.	Vî got.
Inay va.	Naye va.	Vê got.
Inîn va.	Nînan va.	Van got.

## 2. 2. 2. Zemîrê Nîşanî yê Semedê Dûrî (Cînavên Nîşanî Yên Dûr)

Mêrdim çiyêk/kesêk yan zî çîyanê/kesanê dûrî îşaret keno herinda nameyanê înan de nê zemîranê nîşanan xebitneno.

**Tablo 108.** Zemîrê nîşanî yê semedê dûrî yê hem sadeyî hem zî anteyî

FEKÊ ÇEWLÎGÎ		FEKÊ GIMGIMÎ		KURMANCKÎ	
Halo Sade	Halo Oblîk	Halo Sade	Halo Oblîk	Halo Sade	Halo Oblîk
Owi	Ayî	O	Ey	Ew	Wî
Aya	Ayê	A	Aye	Ew	Wê
Ayî	Aynûn	Ê	Înan	Ew	Wan

**Tablo 109.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Owi/wi vûno.	O vano.	Ew dibeje.
Aya vûna.	A vana.	Ew dibeje.
Ayî vûnî.	Ê vanê.	Ew dibejin.

**Tablo 110.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ayî va.	Ê va.	Wî got.
Ayê va.	Aye va.	Wê got.
Aynûn va.	Înan va.	Wan got.

### 2. 3. Zemîro Refleksîf (Cînava Vegerok)

Zemîro ke tesîrê xo reyna dano serê kerdoxî/e, ma ey ra vanîme zemîro refleksîf. No zemîr seba yewhûmarî û zafhûmarî nêvurîyêno. No zemîr nêancîno, yanî hertim sey xo yo. Eke cumle de kerdox û obje eynî bê, herinda objeyî de no zemîr yêno xebitnayene. Mavajîme: “Ez xo nas kena”. Tîya merdim nêşikîno vajo ke “Ez mi nas kena”. Eke ma va “Ey xo nas kerd” çîyêk o, eke ma va “Ey o nas kerd” çîyêkê bîn o.

**Tablo 111. Xo**

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Xwi	Xo	Xwe
Vaşî <b>xwi</b> bi astuar a kirişt.	Vaşê <b>xo</b> ebi astorê ont.	Giyahê <b>xwe</b> bi hespî kişand.
Ti hendê ûmbazûn <b>xwi</b> ne yî.	To hondê hevalanê <b>xo</b> nîya.	Tu qasê hevalên <b>xwe</b> nîne.
Ez şîya vera babî <b>xwi</b> .	Ez ver ba pîyê <b>xo</b> şîyo.	Ez ber bi bavê <b>xwe</b> ve çûm.
Mi kênay <b>xwi</b> rî yew kîtab êrna.	Mi çêna <b>xo</b> rê ju kîtab hêrîna.	Min ji keça <b>xwe</b> re pirtukêk kirî.
Mi lacî <b>xwi</b> kenay xwi ya şawit.	Mi lajê <b>xo</b> çêna xo ra ruşna.	Min kurê <b>xwe</b> bi keça <b>xwe</b> ra şand.
Miyerik pa lacî <b>xwi</b> ya amebi.	Merik ebi lajê <b>xo</b> amebî.	Zilam bi kurê <b>xwe</b> re hatîbû.

**Tablo 112. Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî: Xo**

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Mi xwi rî yew kîtab girot.	Mi xo rê ju kîtab guret.	Min ji xwe re yek pirtuk girt.
Wi xwi bi xwi qîsê keno.	O xo bi xo qesê keno.	Ew xwe bi xwe dipeyîve.

## 2. 4. Zemîrê Persî (Cînavkên Pirsyarî)

Zemîrê persan ma cumleyanê persan de xebitnenîme. Bi nê zemîran ma persa kesan, çîyan ûbn. kenîme. Sey zemîranê bînan nê zemîrî zî sabît nîyê. Ancîna goreyê kaide û qaydeyan vurînê.

### 2.4.1 Kûm (Kî, Kîjan)

**Tablo 113.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî: Kûm (Kî, Kîjan)*<sup>51</sup>

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Kûm biyu niweş?	Kam bîyo nêweş?	Kî bûye nexweş?
Kûmî di qelem esta?	Kamî de qeleme esta?	Bi kê re pênus heyê?
Ti Kûm a?	To kama?	Tu kî yî?
Ena destimal kûm ra kota?	Na mendîle kamî ra gina wara?	Ev destmal ji kê ketîye?
Ti şîyî qêy kûm ya?	To şîya kamî ra pers bikerê?	Tu çûyê ji kê rê bipersî?
Ewi ho kûm vera key kenu?	O cayê kamî de nîşeno ro?	Ew di şuna kê de rûdinî?
Kûm iy tû wo?	Kamcî ê to yo?	Kîjan yê te ye?
Kûm ey tû wa?	Kamcîye ê to ya?	Kîjan yê te ye?
Pêy kûm ya?	Pê kamî?	Bi kê?
Semedey kûm ya?	Seba kamî?	Ji bo kê?
Hiendey kûm?	Qasê kamî	Qasê kê?

<sup>51</sup> Mi nê nimûneyê seba zemîrê persan Harun Turgut, *Türkçe Açıklamalı Zazaca Dilbilgisi*, r. 45-46 ra girewtî. Labelê Turgutî hem herinda “kûm”î ra “kum” nuştî hem zî edatî cîya nênuştîbî. Mi ê kerdî raşt.

## 2. 4. 2 Çinê (Çi)

**Tablo 114.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Tû çinê werd? <sup>52</sup>	To çi werd?	Te çi xwar?
Yi çinêra niamê?	Ê çinay ra nêamê?	Ew çima nehatin?
Çinêy ma estu?	Çikê ma esto?	Çiyê me heye?
Pêy çinêya?	Pê çi?	Bi çi?
Sey çinê?	Zê çi?	Wek çi?
Semedey çinêya?	Seba çinay ra?	Ji bo çi?
Hiendey çinê?	Hondê çinay?	Qasê çi?
Çi estu, çi çiniyu?	Çi esto, çi çin o?	Çi heye, çi tuneye?
Çira?	Çinay ra? Qey?	Çima?

## 2. 4. 3 Ça (Li ku)

**Tablo 115.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Etya ça wu? <sup>53</sup>	Îta kotî yo?	Vir ku ye?
Şima hê çara yenî?	Şima kotî ra ênê?	Hûn ji ku derê tên?
Ti ha çadi?	To kotî ra?	Tu li ku yî?
Çara ça ma wo?	Kotî ra kotî ê ma wo?	Ji ku hetan ku yê me ye?
Hieta ça şima wo?	Hetanî kotî ê şima wo?	Heta ku yê we ye?

<sup>52</sup> Mi nê nimûneyê seba zemirê persan Harun Turgut, Türkçe Açıklamalı Zazaca Dilbilgisi, r. 46-47 ra girewtî.

<sup>53</sup> b., e.e.

#### 2. 4. 4 Çend (Çend)

**Tablo 116.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Şima eni çenda êrna? <sup>54</sup>	Şima no çenda herîna?	We ew biçendan kirî?
Ti çendidi yenî?	To çenda de êna?	Tu saet di çendan de tê?
Çendra çend ez duno?	Çend ra çend ez dano?	Ji çendan çend ez didim?

#### 2. 4. 5 Se (Çi)

**Tablo 117.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Se biyu? <sup>55</sup>	Çi bîyo?	Çi bûye?
Ti hê se kenî?	To se kena?	Tu çi dikî?
Şima se kerd?	Şima se kerd?	We çi kir?
Yê va se?	Aye va çi?	Wê çi got?
Şima hê sera şinî?	Şima şonê kotî?	Hûn bi kuda diçin?

### 3. SIFETÎ (HEVALNAV)

Çiyê ke çimîyan û kesan hetê senînî, hûmarî ûbn. ra tarîf kenê ma înan ra vanîme sifatî. Sifatî cîya cîya yê. Sifatê senînî, hûmarî, nîşanî ûbn. estê. Sifatî kirmanckî de goreyê nameyanê ke verê înan yê, şonê. Yanî nameyê ke virnîya înan yêno, nêr bo, sifata zî beno nêr, mê bo, sifata zî beno mê, zafhûmar bo, sifata zî beno zafhûmar.

<sup>54</sup> b., e.e.

<sup>55</sup> b., e.e.

### 3. 1. Sifetê Nîşanî (Hevalnavên Nîşanî)

Sifetê ke çimîyan, kesan ûbn. musnenê ma, ma înan ra vanîme sifetê nîşanî. Di birrî nîşane sifetî estê: Yew semedê nêzdî, yew zî semedê dûrî.

#### 3. 2. 1. Sifetê Nîşanî yê Semedê Nêzdî (Hevalnavên Nîşanî Yên Nêzîk)

Sifetê ke çimîyan û kesanê nêzdîyan musnenê ma, ma înan ra vanîme sifetê nîşanî yê semedê nêzdî.

**Tablo 118.** Sifetê nîşanî yê semedê nêzdî yê hem sadeyî hem zî anteyî

FEKÊ ÇEWLÎGÎ		FEKÊ GIMGIMÎ		KURMANCKÎ	
Halo Sade	Halo Oblîk	Halo Sade	Halo Oblîk	Halo Sade	Halo Oblîk
Ini	Inî	No	Nê	Ev	Vî
Ina	Inay	Na	Naye	Ev	Vê
Inî	Inîn	Nê	Nînan	Ev	Van

**Tablo 119.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî: Vatene (Gotin)*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ini merdim vûno	No mordem vano	Ev mirov dibeje
Ina kênek vûna.	Na çêneke vana.	Ev qîz dibeje.
Inî kênekî vûnî.	Nê çenekî vanê.	Ev qîz dibejin.
Inî merdimî vûnî.	Nê mordemî vanê.	Ev zilam dibejin.

#### 3. 2. 2. Sifetê Nîşanî yê Semedê Dûrî (Hevalnavên Nîşanî Yên Dûr)

Sifetê ke çimîyan û kesanê dûrîyan musnenê ma, ma înan ra vanîme sifetê nîşanî yê semedê dûrî.

**Tablo 120.** Sifetê nîşanî yê semedê dûrî yê hem sadeyî hem zî anteyî

FEKÊ ÇEWLÎGÎ		FEKÊ GIMGIMÎ		KURMANCKÎ	
Halo Sade	Halo Oblîk	Halo Sade	Halo Oblîkî	Halo Sade	Halo Oblîkî
Owi	Ay	O	Ê	Ew	Wî
Aya	Aya	A	A	Ew	Wê
Ayî	Ay	Ê	Ê	Ew	Wan

**Tablo 121.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî: Vatene (Gotin)*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Owi merdim vûno.	O mordem vano.	Ew mirov dibeje.
Aya kênek vûna.	A çêneke vana.	Ew qîz dibeje.
Ayî kênekî vûnî.	Ê çênekî vanê.	Ew qîz dibejin.
Ayî merdimî vûnî.	Ê mordemî vanê.	Ew zilam dibeji.
Ay merdim ra vaci.	Ê mordemî ra vaje.	Wî zilamî re bibeje.
Aya kênek ra vaci.	A çêneke ra vaje.	Wê keçikê re bibeje.
Ay kênekûn ra vaci.	Ê çêneka ra vaje.	Wan keçan re bibeje.
Ay merdimûn ra vaci	Ê mordema ra vaje.	Wan zilaman re bibeje.

#### 4. EDATÎ (DAÇEK)

Edat bi xo bê mana yo labelê bê edat zî tayê cayan de ma nêşikîme mana bidîme cumle. Kirmanckî de hem veredatî hem zî peydatî estê. Edatî her tim halê anteyî wazenê.

##### 4. 1. Veredat (Peşdaçek)

Veredat edato ke verê çekuya yêno ma înan ra vanîme veredat.



#### 4. 1. 1. Pê/pa/ bi/ebi (bi)

**Tablo 122.** Pê/pa/ bi/ebi (bi)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Pê, pa	Pê, bi/ebi/ebe	Bi

**Tablo 123.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Pê qelema nuşt.	Pê qeleme nivisna.	Pê pênusê nivisand.
Pê destî/dêst werd.	Pê dest werd.	Pê dest xwar.
Pê taksî ame.	Pê taksî ame.	Bi taksîyê hat.
Miyeşnê pa varûn a ruêşîyayî.	Mî ebi vareka ra amî rotene.	Mih bi berxan rê hatin firotin.
Ez pa kincûn a kota miyûn cilûn.	Ez ebi kincan kewto cile.	Ez bi cilan ketime nav nivînan.
Bi peranî xo erînayo.	Ebi pêranê xo herîno.	Bi pereyê xwe kiriye.
Vaşî xwi bi astuar a kirişt.	Vaşê xo ebi astorê ont.	Giyahê xwe bi hespî kişand.

#### 4. 1. 2. Bê

**Tablo 124.** Bê

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Bîye	Bê	Bê

**Tablo 125.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Keye di bîye mi hîrye kesî estî.	Çê de bê mi hîrê kesî binî estê.	Li malê ji bilî mi se kesên din hene.

Ez bê tu nêşina.	Ez bê to nêşono.	Ez bê te naçim
Bîyekes	Bêkes	Bêkes
Bîyewîjdûn	Bêwijdan	Bêwijdan
Bîyekincûn	Bêkinca	Bêcilan
Bîyedadî, bîyebabî	Bêmaye, Bêpî	Bêdê, Bêbav
Bîyeînsaf	Bêînsaf	Bêînsaf

#### 4. 1. 3. Sê/sey (Wek, Mîna)

**Tablo 126.** Sê (Wek, Mîna)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Sê/zê (gibi)	Zê	Wek
Sey/zê	Zê/qasê/hondê	Wek/mîna

**Tablo 127.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Bûnî ma sê/zê bûnî muxtarî yo.	Bonê ma zê bonê muxtarî yo.	Xaniyê me wek xaniye muhtar e.
Qumê yi sê/zê qewax a.	Bejna ê zê qewax a.	Bejna wî wek qewax e.
Wi sey/zê mi nîyo.	O zê mi nîyo.	Ew ne wek min e.
Ti se/zê aşm şoq dûna.	To zê aşme şewk dana.	Tu wek hivê ronî didin.
Şima sey/zê ma doletî neyî.	Şima zê ma zengîn nîyê.	Hûn wek min ne devlemend in.

#### 4. 1. 4. Hieta, hetûn, heta (Heta, Heya, Heyanî)

**Tablo 128.** Hieta, hetûn (Heta, Heya, Heyanî)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Hieta, hetûn	Heta, hetanî, heyânî	Heta, hetanî, heyâ

**Tablo 129.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Hetûn/heta ti biyerî ma şinî.	Hetanî to berê, ma şonîme.	Heya tu werî em ê biçin.
Muş ra heta Sarcûn sinorî Çolîgî yo.	Muş ra heta Sarcûnî sinorê Çewlîgî yo.	Ji Muşê heta Sarcunê sînorê Çewlîgê ye.
Hieta serna ena dar bena <sup>56</sup> derg.	Heta serrena na dare bena derge.	Heya salêna ew dar dibe direj
Wi hieta siba resenu uca.	O hetanî şodir reseno uca.	Ew heyâ sibe digîhîşe wî dere.
Ez hieta îstasyun pay şiyoy.	Ez hetanî îstasyon pîyatî şiyoy.	Ez heyâ îstasyonê peya çûm.
Yew kiloy sayun hieta punc mark hê rueşiyen.	Ju kilo saye hetanî ponc marka êno rotene.	Yek kîlo sêv heyâ penc marka tê firotin.
Ya hieta etya amêya	A hetanî îta ama	Ew heyâ li vir hatiye

#### 4. 1. 5. Ver a/verba (Ber bi)

**Tablo 130.** Ver a/verba (Ber bi)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Vera, verba	Ver bi/verba	Ber bi

<sup>56</sup> Nê tabloyî de nayê ra tepîya, nê çeku mi, Harun Turgut, Türkçe-Zazaca Sözlük, Do Yayınları, İstanbul, 2008, r. 165 ra girewtî.

**Tablo 131.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

<b>FEKÊ ÇEWLÎGÎ</b>	<b>FEKÊ GIMGIMÎ</b>	<b>KURMANCKÎ</b>
Ez şina, wi zî vera mi yeno.	Ez şono, o jî ver ba mi êno.	Ez diçim, ew jî ber bi min ve tê.
Ez şina verba Xarpîyêt.	Ez şono ver ba Xarpit.	Ez diçim ber bi Xarputê.
Ez şîya vera babî xwi.	Ez ver ba pîyê xo şîyo.	Ez ber bi bavê xwe ve çûm.

#### **4. 2. Peyedat (Paşdaçek)**

Edatê ke yênê peynîya çekuye ma înan ra vanîme peyedatî. Goreyê Kurmanckî peyedatî kirmanckî de zêdetir wayîrê fonksîyon ê.

##### **4. 2. 1. Ri (Re)**

**Tablo 132.** Ri (Re)

<b>FEKÊ ÇEWLÎGÎ</b>	<b>FEKÊ GIMGIMÎ</b>	<b>KURMANCKÎ</b>
Ri, r`	Rê	Re

**Tablo 133.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

<b>FEKÊ ÇEWLÎGÎ</b>	<b>FEKÊ GIMGIMÎ</b>	<b>KURMANCKÎ</b>
Ez kûmî ri vûna.	Ez kamî ra vano.	Ez ji kê re dibejim.
Mi ri yew tasê awk bîya!	Mi rê tasê awe bîya!	Ji min re tasêk awe bîne!
Mi kênay xwi rî yew kîtab êrna.	Mi çêna xo rê ju kitab hêrîna.	Min ji keça xwe re pirtukêk kirî.

Fekê Çewlîgî de qiseykerdene de zafêrî no edato “ri” û çekuya ke dima yêna pîya yênê vatene. Nimûneyî:

Ez kûmir’ vûna. (Ez ji kê re dibejim.)

Mir' yew tasê awk bîya. (Ji min re tasêk awe bîne!)

Mi kênay xwir' yew kîtab êrna. (Min ji keça xwe re pirtukêk kirî.)

#### 4. 2. 2. Di (di...de)

**Tablo 134.** Di (di...de)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Di	De	Di...de

**Tablo 135.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ez dew di ameya dinya.	Ez dewe de ama dinya.	Ez li gund hatime dinyayê.
Kîtab ho çantê mi di.	Kîtab çentê mi der o.	Pirtuk di çentê min de ye.
Çewlîg di yo/yew sempozyum virazîya.	Çewlîg de ju sempozyum ame viraştene.	Li Çewlîgê sempozyumêk hat çêkirin.

Fekê Çewlîgî de qiseykerdene de zafêrî no edato “di” peynîya çekuya ke dima ey yêna sey “id” zeleqîno pa. Nimûneyî:

Ez dewid ameya dinya. (Ez li gund hatime dinyayê.)

Kîtab ho çante mid. (Pirtuk di çentê min de ye.)

Çewlîgid yo/yew sempozyum virazîya. (Li Çewlîgê sempozyumêk hat çêkirin.)

#### 4. 2. 3. Ya/a (Ra/va)

**Tablo 136.** Ya/a (Ra/va)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ya, a	Ra	Ra, va

**Tablo 137.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Mi lacî xwi kenay xwi ya şawit.	Mi lajê xo çêna xo ra ruşna.	Mi kurê xwe bi keça xwe ra/va şand.
Ez semedî kombîyayîşî ya ameya.	Ez seba kombîyayîşî ra ama.	Ez ji bo ciwînê hatim.

#### 4. 2. 4. Ser o (Li Ser)

**Tablo 138.** Ser o (Li Ser)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ser o	Serê... ra	Ser/Li Ser

**Tablo 139.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Defter ho masa ser o.	Deftere serê masa ra ya.	Lenûsk li ser masê ye.

#### 4. 3. Veredat û Peyedatî Pîya (Pêşdaçek û Paşdaçek Bi Hev Re)

Kirmanckî de tayê edatî pîya yê nê xebitnayanê. Nê edatan ra tayê verê, tayê pêyê çekuye de yê nê.

##### 4. 3. 1. Pê...ya/pê...a (Bi)

**Tablo 140.** Pê...ya/pê...a (Bi)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Pê...ya / pê...a	Pê, ebi	Bi

**Tablo 141.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

<b>FEKÊ ÇEWLÎGÎ</b>	<b>FEKÊ GIMGIMÎ</b>	<b>KURMANCKÎ</b>
Merdîm pê teyara hîna lez şino.	Mordem pê teyara dayîna çapik şono.	Mirov bi teyaran leztir diçe.
Nika her gureyî daîreyan pê computer a virazîyeno.	Nika her karê daira ebi computurî êno kerdene.	Niha her karê daireyan bi computerê tê kirin.
Miyerik pa lacî xwi ya amebi.	Merik ebi lajê xo amebî.	Zilam bi kurê xwe rê hatîbû.
Engur pa bezra ya werîyena.	Tirî ebi dendika êna werdene.	Tirî tevî dendikan tê xwarin.
Wi pa solun a ame zerre.	O ebi milasa ame zerre.	Ew bi solan hat hûndir.

#### 4. 3. 2. Qay...ya/qay...a (Ji bo)

**Tablo 142.** *Qay...ya/qay...a (Ji bo)*

<b>FEKÊ ÇEWLÎGÎ</b>	<b>FEKÊ GIMGIMÎ</b>	<b>KURMANCKÎ</b>
Qay...ya/qay...a	Seba	Ji bo

**Tablo 143.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

<b>FEKÊ ÇEWLÎGÎ</b>	<b>FEKÊ GIMGIMÎ</b>	<b>KURMANCKÎ</b>
Ma qay/qey şîma ya/wa amê.	Ma seba şîma amîme.	Em ji bo we hatin.
Mi qay/qey lacî xwi/wa/ya îna kerd.	Mi seba laje xo nîya kerd.	Min ji bo kurê xwe wisa kir.

### 4. 3. 3. Semedî...ya/semedî...a (Ji bo)

**Tablo 144.** Semedî...ya/semedî...a (Ji bo)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Semedî...ya/semedî...a	Seba	Ji bo

**Tablo 145.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ez semedî veyvî ya ameya Çolîg.	Ez seba veyvî amo Çewlîg.	Ez ji bo davetê hatim Çewlîgê.
Semedî şarî ya xwi eciz mekeri.	Seba şarî xo eciz meke.	Ji bo xelkê xwe aciz neke.

## 5. BESTOXÎ (GIHANEK)

Nameyê xo ra zî aseno ke bestoxî cumleyan de vateyan, çekuyan ûbn. bestenê, yani giredanê. Bestox ke tena serê xo bo, mana ey çin a. Bestoxî karê qîseykerdoxan yan zî nuştoxan kenê asan. Merdim bi ardimê bestoxan hem leztir hem zî rehetir qîsey keno, nuseno.

### 5. 1. Eg/eger (Heke)

**Tablo 146.** Eg/eger (Heke)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Eg, eger	Eke	Heke

**Tablo 147.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Eg ti bîyerî ez zî yena.	Eke to bêrê ez jî êno.	Heke tu werî ez jî têm.
Eger ti neşkenî bîyêrî, lacî xwi bişawi.	Eke to nîşkîna bêrê, lajê xo biruşne.	Heke tu nikarî werî kurê xwe bişîne.



## 5. 2. Zî (Jî)

**Tablo 148.** Zî (Jî)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Zî	Jî/kî	Jî

**Tablo 149.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Lacî mi zî kêneyê mi zî şinî mekteb.	Lajê mi jî çênayê mi jî şona mektebe.	Kurê min jî, keça min jî diçe wendegehê.
Şarî Çolîgî zî, şarî Palî zî kirdkî qalî keno.	Şarê Çewlîgî jî şarê Palu jî kirdkî qesey kenê.	Xelkê Çewlîgê jî xelkê Paluyê jî bi kirdkî dipeyîvin.

Fekê Gimgimî de tayê cayan de “jî” tayê cayan de “kî” vajîyêno, yê Çewlîgî de zî “zî” vajîyêno, labelê qiseykerdene de no bestoxê “zî” peynîya çekuya ke dima ey yêna sey “iz” zeleşîno pa. Nimûneyî:

Lac miz’, kêney miz’ şinî mektep. (Kurê min jî, keça min jî diçe wendegehê. )

Şarî Çolîgiz’, şarî Palîz’ Kirdkî qalî keno. (Xelkê Çewlîgê jî xelkê Paluyê jî bi kirdkî dipeyîvin.)

## 5. 3. Ki (Ku)

**Tablo 150.** Ki (Ku)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ki, g`	Ke	Ku

**Tablo 151.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ez wext ki (waxto g`) şîya üniversite, ez 20 serrî	Ez waxto ke şîyo üniversite, 20 serrî bîya.	Wextê ku ez çûm zanîngê ez 20 salî bûm.

bîya.		
O merdimo ki (merdimog') ho yeno, dewijî ma yo.	O mordemo ke êno dewa ma ra yo.	Ew zilam ku tê, ji gunde me ye.
Ez şîya Almaya ki biwûnî.	Ez şîyo Almanya ke biwanî.	Ez çûm Elemanya da ku bixwinim.

Fekê Çewlîgî de “ki” qîseykerdene de peynîya çekuya ke dima ey yêna sey “k” zeleşîno pa. Xêca naye formê “g” yêno xebitnayene. Nimûneyî:

Ez wextik' şîya universite, ez 20 serrî bîya. (Wextê ku ez çûm zaningehê ez 20 salî bûm.)

O merdimog' ho yeno, dewijî ma yo. (Ew zilam ku tê, ji gunde me ye.)

Ez şîya Almanyag' ez biwunî. (Ez çûm Elemanya da ku bixwinim.)

#### 5. 4. Go (Ku)

**Tablo 152.** Go (Ku)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Go	Ke	Ku

**Tablo 153.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ez wexti go şîya universite, ez 20 serrî bîya.	Ez waxto ke şîyo universite, 20 serrî bîya.	Wextê ku ez çûm zaningehê ez 20 salî bûm.

## 5. 5. Çimkî (Çimkî, Lewra)

**Tablo 154.** Çimkî (Çimkî, Lewra)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Çimkî/çunkî	Çunke, çike	Çimkî

**Tablo 155.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
O ders nexebitîya, çimkî top kaykerd.	O derse nêxebitîya, çike tope kay kerde.	Ew ders nexebitî, çunkî top dilîst.
Ez neşkaya bîyerî çimkî gurê mi bi.	Ez nîşkîya bêrî, çike karê mi bî.	Ez nikaribûm bihatama, çunkî karê min hebû.

## 5. 6. La (Lê)

**Tablo 156.** La (Lê)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
La	Hama	Lê

**Tablo 157.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Wi neame la yew mektup şawit.	O nîyame, hama ju mektube ruşne.	Ew nehat lê name şand.
Ya emeliyet bîy la hol nêbî.	A emelet bîye hama weş nêbîye.	Ew ameliyat bû lê xweş nebû.

### 5. 7. Cueka (Loma)

**Tablo 158.** Cueka (Loma)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Cueka	Coka	Loma

**Tablo 156.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
O ders nexebetîya cueka zayif girot.	O ders nêxebetîya coka zayif guret.	Ew ders nexebetî loma zayif girt.
Gurê mi bi, ez cueka nemeya.	Karê mi bî, coka ez nîyamo.	Karê min hebû, loma ez nehatim.

### 5. 8. Aye ra (Ji ber vê yekê)

**Tablo 159.** Aye ra (Ji ber vê yekê)

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Aye ra	Aye ra	Ji ber vê yekê

**Tablo 160.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
O ders nexebetîya, ayê ra babî yi yers bi.	O ders nêxebetîya aye ra pîyê ê hers bî.	Ew ders nexebetî ji ber vê yekê bavê wî hers bû.
Gurê mi bi, ayê ra ez neşkaya bîyerî.	Karê mi bî, aye ra ez nîşkîya bêrî.	Karê min hebû, ji ber vê yekê ez nehatim.

## 5. 9. Ini rid ra/o ridi ra (Seba vê/wê)

**Tablo 161.** Ini rid ra/o ridi ra

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Ini rid ra/o ridi ra	Sebetanê nê ra	Seba

**Tablo 162.** *Seba xebitnayîşê mîyanê cumleyan de nimûneyî:*

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
O ders nexebetîya ini rid ra zêf girot.	O ders nêxebetîya sebetanê nê ra zayif guret.	Ew ders nexebetî seba vê zayif girt.
Gurê mi bi o rid ra ez nemeya.	Karê mi bî, sebetanê nê ra ez nîyama.	Karê min hebû, seba wê ez nehatim.

## 5. 10. Tayê Bestoxanê ke Di-hîrê Çekuyan ra Virazîyayê

(Hin Gihanekên ke ji du-se Peyvên Hatiye Çêkirin)

**Tablo 163.** Tayê Bestoxanê ke Di-hîrê Çekuyan ra Virazîyayê

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Çend...ehend	Çend...hondê	Çend...ewqas
Çiqas... ehend	Çiqas... hondê	Çiqas...ewqas
Çiqas ki...ehend	Çiqas ke... hondê	Çiqas ku...ewqas
Ge...ge	Ge...ge	Geh...geh
Him...him	Hem...hem	Hem...hem
Ne...ne zi	Ne... ne jî	Ne... ne jî
Nûn... nûn	Yan...yan	An...an
Nûn... nûn zî	Yan...yan jî	An...an jî

## 6. Hûmarî (Jimar)

**Tablo 164.** Hûmarî

FEKÊ ÇEWLÎGÎ	FEKÊ GIMGIMÎ	KURMANCKÎ
Yo	Ju	Yek
Di	Dide	Du/dudu
Hîrye/hîri	Hîrê	Sisê
Çeher/çahar	Çar	Çar
Pûnc	Ponc	Pênc
Şeş	Şeş	Şeş
Hot	Hawt	Heft
Heşt	Heyşt	Heşt
No	New	Neh
Des	Des	Deh
Yondes/yûndas, des û yo	Des û ju	Yazdeh
Duyes, des û di	Des û dide	Duwazdeh
Hîres, des û hîrye/des û hîri	Des û hîre	Sêzdeh
Çares, des û çeher/ des û çar	Des û çar	Çardeh
Pûncîyes, des û pûnc	Des û ponc	Panzdeh
Şîyes, Des û şeş	Des û şeş	Şanzdeh
Hotîyes, des û hot	Des û hawt	Hevdeh
Heştîyes, des û heşt	Des û heyşt	Hejdeh
Nêbîyes, des û no	Des û new	Nozdeh
Vîst	Vîst	Bîst
Hîris	Hîris	Sî

Çoras	Çewres	Çil
Pûncas	Poncas	Pencî
Şêşt	Şeşfî	Şêst
Hotay	Hawtay	Heftê
Heştay	Heştay	Heştê
Neway	Neway	Nod
Se	Sed	Sed

**7. Tayê Çekuyê ke Her Di fekan de Cîya yê (Peyvên ku Her Du Devokan de Cuda ne)**

**Tablo 165.** Tayê Çekuyê ke Her Di fekan de Cîya yê

<b>FEKÊ ÇEWLÎGÎ</b>	<b>FEKÊ GIMGIMÎ</b>	<b>KURMANCKÎ</b>
Alişk	Surote	Dêm
Aqreb	Dimpiştike	Dûpişk
Ayne	Qûtîye	Neynik
Baba	Pî	Bav
Bapîr	Kalik	Bapîr
Bexîlê	Çimêsîyatîye	Çikûsî
Bezra	Dendike	Dendik
Binêna	Tayêna	Hinek din
Çerrê, çerrey	Cara	Tu carî
Çerrêna	Tewr, qet	Tu carî, qet
Destveng	Desttal	Destvala
Det, dat	Ap	Ap

Detkeyna	Derçêna	Dotmam
Embaz, ombaz	Heval	Heval
Erşawitiş, erşawayiş	Ruşnayene	Şandin
Eşnawitiş	Heşnayene	Bihîstin
Ewna, una	Nîya, hînî	Wilo, wisa
Gede	Doman	Zarok
Henek	Leqî	Henek
Henek kerdiş	Leqî kerdene	Henek kirin
Hewna, honê	Reyna, oncîya	Dîsa
Hewnaşaye	Şîyo xo ra	Vemiriye
Hewverî, hovêr	Virnîye, virnîye de	Serî de,
Kerra	Kemere	Kevir
Kerrayin	Kemerin	Kevirin
Kiriştiş	Ontene	Kişandin
Kuî, kuy	Kundure	Kundir
Liheyf, leheyf	Organ	Lihêf
Merg	Merdene	Mirin
Mîrçik, milçik	Çûçike	çivîk
Mîzwir	Mîzeker	Mîzker
Muercele, mocle	Miloçike	Morî
Nûşte kerdiş	Nivişt kerdene	Nivişt kirin
Nûşte, nişte	Nivîs	Nivîs
Nûştiş, nûsayiş	Nivisnayene	Nivîsandin
Pabeste	Giredaye, giredayî	Girêdayî, bestî



Pîzhera	Vereher	Xure, xwere, xwarok
Qerzax	Qilancike	Qirik
Ruece tepîştîş	Roje guretene	Rojî girtin
Uniyayîş, ewnîyayîş	Qayt kerdene	Meze kirin
Valyer	Vîyale	Darebî
Veng	Tal	Vala
Veng kerdiş	Tal kerdene	Vala kirin
Veng mendiş	Tal mendayene	Vala man
Xalcînî	Xalojine	Xalojin

### PEYNÎYE (ENCAM)

Seke gilê dare serê eynî koke ra her yewê înan hetê ra şono, fekê eynî ziwanî zî her yew hetê ra şono. Sebebê nê her yew hetê ra şîyayîşê înan tewir bi tewir ê. Mîyanê nê sebebana de tayê cografî, tayê tesîrê kulturê yê bînan de mendene, tayê tesîre bawerîya înan estê, velhasil sebebê înan zaf ê. Xora armancê na xebate tespîtkerdena nê sebebana nêbî. Armancê na xebata zedêrî mîyanê fekê Çewlîgî û fekê Gimgimî de çî ferqe esta, serê nê ra bî. Na xebate de tayê ferqê ke amê tespîtkerdene nayê:

1. Fekê Çewlîgî de vengê “û”, fekê Gimgimî de zafêrî bena “a”.
2. Fekê Çewlîgî de vengê “c”, fekê Gimgimî de zafêrî bena “j”.
3. Tayê cayan de fekê çewlîgî de vengê “k”, fekê Gimgimî de bena “ç”.
4. Fekê Çewlîgî de vengê “we”, fekê Gimgimî de zafêrî bena “o”.
5. Fekê Gimgimî de sey fekê Çewlîgî di herfê vengî zaf nê nê têlewe.
6. Fekê Çewlîgî de nameyê makî xoser ê, suffîksê “e” ya ke nişanê makîyî dana nêgenê. Tîya sifet zî goreyê nameye nêşono. Mavajîme vanê “awka zelal”, nêvanê “awka zelale”.

7. Fekê Gimgimî de suffiksê zafhûmarî nameyê xoser de “-î”, nameyê anteyî de “-an” o, labelê fekê çewlîgî de suffiksê zafhûmarî nameyê xoser de ge-ge “-ê”, ge-ge “î”, ge-ge zî sey Kurmanckî herfa ke verê herfa pêylene yêna, a ancîna, nameyê anteyî de “ûn” o.
8. Fekê Gimgimî de suffiksê îzafe seba nameyê makî “a”, seba nameyê nêrî “ê” seba zafhûmarî “ê” yo labelê fekê Çewlîgî de suffiksê îzafe seba nameyê makî “ê”, seba nameyê nêrî “î” seba zafhûmarî “ê” yo. Tayê cayan de fekê Çewlîgî de suffiksê îzafe nênê xebitnayenê.
9. Zemirê kesanê yê hîreyin her di fekan de ferqlî yê.
10. Zemirê kesî yî dîyin de, fekê Çewlîgî de zayend esto, yê Gimgimî de çin o.
11. Suffiksê mesderî fekê Gimgimî de “-ene”, fekê Çewlîgî de zî “îş” o.
12. Fekê Çewlîgî de demê vîyartî de eke kar transtîf bî, obje zî zahûmar bîye, a taw hurînda suffiksê zahûmarîye de kar de herfa vengîne yêna antene. Numûne: Yay vizêr di sonîk wênd (Wê do du xeberoşk xwendin).
13. Fekê çewlîgî de prefiksê negatîfî “ni”<sup>57</sup> yo, fekê Gimgimî de “nê” yo.

---

<sup>57</sup> Goreyê W. K. Merdimîn no prefiks “ni” yo, b. “Fekê Çewlîgî de Antişê Karan (Fîlan)”, *Vate (Kovara Kulturî)*, Hûmar 20, Stockholm, Hamnan 2003, r. 90

## ÇİMEYÎ (ÇAVKANÎ)

- Aksan, Doğan: *Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2009
- Ayçiğeg, Mehmûd Arîf: *Ha Vaj, Ha Vaj*, Stenbol, 2013
- Aygen, Gulsat, *Kurmancki/Zazaki Kurdish Grammar*. Languages of the World Materials 479, Munchen: Lincom Europa, 2010.
- Baba, Mehmet: *Folklorê Dewa Goşkarî ra Tay Nimûneyî*, Projeyê Masterê Bêtezî, Unîversîteya Artûklûyî ya Mêrdînî, (nêçapkîrî), Mêrdîn, 2013
- Ballikaya, Huseyin: *Dêvo Kor, Estanikanê Gimgimî ra*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2010
- Başî, Xidirê: *Gula Xizirî*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2002
- Bayraktar, Nesrin: *Dil Bilimi*, ç. 2, Nobel Yayın Dağıtım, Ağustos, 2006
- Beytaş, Ali: *Şaîsmayîl, Estanikanê Gimgimî ra*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2002
- Bor, Burçîn: *Hêvîya Macire*, Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir, 2013
- Bor, İsmet: *Vistonikê Dadîye Mi*, Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir, 2013
- Çem, Munzur: *Türkçe Açıklamalı Kirmancca (Zazaca) Gramer*, Deng Yayınları, İstanbul, 2003
- Çiçek, Alî Aydin: *Teberik*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2010
- Çiçek, Murat: *Tehlîlê Panc Estanekan*, Projeyê Masterê Bêtezî, Unîversîteya Artûklûyî ya Mêrdînî, (nêçapkîrî), Mêrdîn, 2013
- Dorleijn, Margreet: *The Decay of Ergativity in Kurmanci*, Tilburg University Press, 1996
- Farqînî, Zana, *Ferheng, Sözlük*, Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî, Enstituya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2007
- Gedik, Akman: *Roj Ma De Şewle Dano*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2012
- : *Gimgim Zerreyê Ma De*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2004
- Grûba Xebate ya Vateyî: *Ferhengê Kirmanckî (Kirmanckî) –Tirkî*, ç. 4, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2011
- : *Rastnuştîşe Kirmanckî (Kirmanckî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005

- : *Türkçe–Kırmancca (Zazaca) Sözlük*, Çapa hîrêyine ya hîrakerdiye, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2009
- : *Sanikê Vateyî*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2009
- Gündüz, Deniz: *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Kırmancca/Zazaca Dil Dersleri*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2009
- : *Kalaşnikof*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2009
- Hassanpour, Amir: *Kürdistan 'da Dil ve Milliyetçilik (1918-1985)*, çar. İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan, Avesta Yayınları, İstanbul, 2005)
- : *Nationalism and Language in Kurdistan 1918-1985*, Mellen Research University Press, San Fransisco, 1992)
- Jacobson, C. M.: *Rastnustena Zonê Ma*, Vêjiyaişê Tiji, 2001
- Kalçık, Hasan: *Bingöl Ağzının Bazı Özellikleri*, Word Dosyası
- Karasu, Doğan: *Bingöl' de Sosyal ve Kültürel Yaşam*, İstanbul, 2004
- Kocadağ, Çeko: *Ferheng, Kırmanckî (Zazakî)–Kurmancî, Kurmancî–Kırmanckî (Zazakî)*, Weşanên KOMKAR, 2010
- : *Razara Dimilki, Türkçe Açıklamalı Zazaca Gramer*, Çapa Serbeste, Berlin
- Kurij, Seyîdxan: “Fekê Çewlîgî de Antişê Karan (Fîilan) I”, *Vate (Kovara Kulturî)*, Hûmare 17, Stockholm, Wisar 2002
- : “Fekê Çewlîgî de Antişê Karan (Fîilan) II”, *Vate (Kovara Kulturî)*, Hûmare 18, Stockholm, Hamnan-Payîz 2002
- : “Fekê Çewlîgî de Antişê Karan (Fîilan) III”, *Vate (Kovara Kulturî)*, Hûmare 19, Stockholm, Zimistan–Wisar 2003
- : *Wayê Hot Birayûn, Sanikan û Deyîranê Çewlîgî ra*, Weşanên Arya, 2002
- LIDDELL&SCOTT: Greek-English Lexicon*, Oxford, 2003
- Longman Dictionary of Contemporary English, New Edition, 1991
- Malmîsanij: *Zazaca-Türkçe Sözlük, Ferhengê Dimilkî-Tirkî*, Deng Yayınları, İstanbul 1992
- : *Kird, Kırmanc, Dimili veya Zaza Kürtleri*, Deng Yayınları, İstanbul 1996
- : *Ji bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmanckî)–Tirkî*, Rûpel, İstanbul, 2012

- : Kürtçede Ses Değişimi, Vate Yayınevi İstanbul, 2013
- Merdimîn, W. K. : “Fekê Çewlîgî de Antişê Karan (Fîlan)”, *Vate (Kovara Kulturî)*, Hûmare 20, Stockholm, Hamnan 2003
- : *Diwan, Şiîr*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2004
- Mîrvanî, Sîyamend: *Kal Mûsêni Zeydûnû*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2012
- Pamukçu, Fahri: *Giramerê Kirmanckî*, Tij Yayıncılık, İstanbul, 2001
- Porzig, Prof. Dr. Walter: *Dil Denen Mucize*, çeviren: Prof. Dr. Vural Ülkü, Türk Dil Kurumu Yayınları, ç. 3, Ankara, 2011
- Tan, Sami: *Rêzimana Kurmanckî, çapa berfirehkirî*, Enstituya Kurdî, ç. 2, 2011
- Taşlıkıkkoğlu, Pro. Dr. Zafer: *Grekçe Gramer ve Syntaks*, İstanbul Edebiyat Fakültesi Yayınları, İstanbul, 1981
- Turgut, Harun: *Türkçe Açıklamalı Zazaca Dilbigisi*, Tij Yayıncılık, İstanbul 2010
- : *Türkçe-Zazaca Sözlük*, Do Yayınları, İstanbul 2008
- Uzun, Mehmet: “Fekanî Kirmanckî û Problemanî Standardîzekerdişî Ser o”, *Vate (Kovara Kulturî)*, Hûmare 1 (21), İstanbul, Payîz 2003
- Wheelock, Frederic M.: *Wheelock’s Latin*, revised by Richard A. LaFleur, Harper Collins, 2000
- Yıldırım, Prof. Dr. Kadri: *Kürtçe Dilbilgisi*, ç. 2, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2012
- Yıldırım, Prof. Dr. Kadri, ûsn.: *Edebîyatê Kirmanckî ra Nimûneyî*, (Zazaca Edebiyatından Örnekler) Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mêrdîn, 2012
- ÇİMEYÊ DIJÎTALÎ (ÇAVKANÎYÊN DIJÎTALÎ)**
- Csirmaz, Aniko and Markéta Ceplová, *Other Options without Optionality*, Massachusetts Institute of Technology
- [http://home.utah.edu/~u0587010/Papers\\_files/zazaki-lightverbs.pdf](http://home.utah.edu/~u0587010/Papers_files/zazaki-lightverbs.pdf)
- Muş Valiliği Web Sitesi, [http://www.mus.gov.tr/default\\_b0.aspx?content=1014](http://www.mus.gov.tr/default_b0.aspx?content=1014)
- Todd, Lynn Terry: *A Grammer of Dimili, Also Known as Zaza*, Tezê Doktora, the Universiteya Michigane, çapê elektronîkî, 2008,
- <http://www.zazaki.de/english/T.L.Todd-AGrammarofDimli.pdf>
- UNESCO Atlas of the World's Languages in Danger,
- <http://www.unesco.org/culture/languagesatlas/index.php?hl=en&page=atlasmap&cc2=TR>

TC  
Mardin Artuklu Üniversitesi  
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü  
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı  
Yüksek Lisans Tezi

KIRMANCCA (ZAZAKİ) DA ÇEWLÎG (BİNGÖL)  
VE GIMGIM (VARTO) AĞIZLARININ  
KARŞILAŞTIRILMASI

İBRAHİM BİNGÖL

11711013

Tez Danışmanı  
PROF. DR. KADRİ YILDIRIM

Mardin 2013